

Lêdana vaksîna koronavîrûsê

GIRING: Vaksînlêdan dilxwaz û belaş e!

1. Vaksînen pejirandî li Almanya

Vaksîn	Agahyan
BionTech	<ul style="list-style-type: none"> • Cûreya vaksîne: vaksîna mRNA • Pêşniyara vaksînlêdanê: ji 12 salan ve hatiye pejirandin • Bernameya vaksînlêdanê: du doz di navberê 4 hefteyan de
Moderna	<ul style="list-style-type: none"> • Cûreya vaksîne: vaksîna mRNA • Pêşniyara vaksînlêdanê: ji 18 salan ve hatiye pejirandin • Bernameya vaksînlêdanê: du doz di navberê 4 hefteyan de
Astrazeneca	<ul style="list-style-type: none"> • Cûreya vaksîne: Vaksîna vektor • Pêşniyara vaksînlêdanê: Mirovên 60 salî û mezintir û kesên di navbera 18 û 59 salî de piştî şîreta bijîşkî ya pêşîn û nirxandina rîska kesane • Bernameya vaksînlêdanê: vaksînlêdan niha heterojen e, ango vaksînlêdana yekem bi Astrazeneca tête kirin û vaksînlêdana duyemîn piştî 4 hefteyan di zûtirîn dem de bi vaksîna mRNA tête kirin.
Johnson & Johnson	<ul style="list-style-type: none"> • Cûreya vaksîne: Vaksîna vektor • Pêşniyara vaksînlêdanê: Mirovên 60 salî û mezintir û kesên di navbera 18 û 59 salî de piştî şîreta bijîşkî ya pêşîn û nirxandina rîska kesane • Bernameya vaksînlêdanê: yek doz

2. Belgeyên Pêdivî

Jimare	Belge
1.	Nasname an pasport
2.	Pelê agahdariyê ji bo lêdana vaksîna koronavîrûsê (2 x) <ul style="list-style-type: none"> ➤ bi zimanên cuda heye li: https://www.zusammengegencorona.de/downloads/?filter=alldownloads&sort=date
3.	Forma razîbûnê tê de dîroka bijîşkî ji bo lêdana vaksîna koronavîrûsê (2x) <ul style="list-style-type: none"> ➤ bi zimanên cuda heye li: https://www.zusammengegencorona.de/downloads/?filter=alldownloads&sort=date
4.	Tenê piştî ku hûn bi rêya Komeleya Bijîjkên Bîmeya Tenduristiyê ya Yasayî randevûyê bigirin. Pejirandina randevûyê
5.	Ger hebe: belgeyên bijîşkî yên wekî plana derman an karta alerjiyê
Karta bîmeya tenduristiyê ne hewce ye.	

3. Proseya vaksînlêdanê

Prose	Ravekirin
Tomarkirin	Li gorî belgeyên ku we bi xwe re aniye, dê datayên vaksînlêdanê werin tomarkirin.
Agahdariya bijîşkî	Heke we berê li malê kaxezan tijî nekiribe, ew ê pelê agahdariyê û forma razîbûna lêdana vaksîna koronayê bidin we.
Şewirkirin bi bijîşk re	Derfeta we heye ku hûn li ser lêdana vaksîna koronavîrûsê û her bandorên nehs ên gengaz pirsan ji bijîşk bikin.
Vaksînlêdan	Vakslêdan ji hêla pisporên perwerdekirî ve tê kirin.
Şopandin	Rûniştina kurt (herî zêde 30 deqîqe) di bin çavdêriya bijîşkî de wekî tedbîrek.

Hûn dikarin bêtir agahdarî bistînin - her weha bi zimanên cuda - li www.kreis-kleve.de.